BANG

Nivîskarên kurd Sotandina pirtûkên Dr. Ferhad Pîrbal şermezar dikin

02 Tebax 2009 Yekşem

Ev diyaderde, Iskenderê Mekedonî, sotandina Avesta Zerdeşt, Holako û Cengîzxan, tîne bîr û hizra me.

Eger hat û têgehiştin di nav komelek genc di civatê de gehişte wê radeyê ku pirtûkan bisotênin, êdî em hemî fatîheyekê li ser paşerojeke wan kesan bixwênin.

Diyaredeya sotandina pirtûkên Dr. Ferhad Pîrbal, rewşenbîr hizirvanê kurd, ji hêla hinek genc, diyardeyeke xerab û neşêrîn e.

Ev diyaderde, Iskenderê Mekedonî, dema Avesta Zerdeşt sotand û Holako û Cengîzxan, ew yên li dijî rewşenbîrî û zanînê bûn, tîne bîr û hizra me.

Sotandina pirtûka nivîserekî, ji hêla derûnî ve, sotandina derûna nivîskarî bi xwe ye, kuştina hizra wî ye, wate kuştina wî ye, çunku her nivîsek ji dax û derûnî nivîskarî bi xwe derdikeve. Ji xwe sotandina mirovan, karekî nemirovane ye.

Bêguman sotandina hizr û bîran, ku di rêka pirtûkan de diyar dibe û bi taybetî pirtûkên rewşenbîrekî mîna Dr. Ferhad Pîrbal, karekî her yekcar nerewşenbîrane, nemirovane û ne di xizmeta rewşenbîra kurdî de ye, ku bi sedê salan hatibû binpêkirin û rê pê nedabû daku geş bibe.

Vêca her ji bo çi sedemî jî be, bila bibe, diyardeya stoandina pirtûkan, hevnepejirandin, rêz li bîr û hizrên êkûdu nekirine, ne di sûdeya gelê me yê kurdistanî de ye. Ji bilî wê jî karekî, paşketî û xerab e.

Ji bo rewşenbîran, kaxez û pênûs amûrê herî giring e, ku bi wan bersiv bête dayîn, bêyî ku ji çarçewa rêzlêgirtin û hevpejirandin derkeve û bibe sedema tunekirina ramana yê li hember e û dîtina her bîrûrayekî cuda bîre û hizrên nerast in û divêt nemînin, her wisa jî xwediyê wê mîna kesekî dijmin bête dîtin.

Sotandina pirtûkan şêwehizra mirovên totalîter û nexweş e

Em çend nivîskar û rewşenbîr yên li bin imze dikin, vî karê stoandina pirtûkên

Dr. Ferhad Pîrbal bi tundî şermezar dikin û hêvî dikin, ku kar û buyerên weha êdî li Kurdistan rû nede, belkî berovajî wê, Kurdistan bibe bazara geşbûna pirtûkê û pirtûkxaneya kurdî dewlemend bibe û bibe cihê hinartina hizr û bîran

bo hemi cîhanê.

Tengezar Marînî	Nivîskar	Elmaniya
Rondik Bamernî	Nivîskar	Elmaniya
Edîb Çelkî	Nivîskar	Elmaniya
Merwan Osman(Royarê Amedî)	Nivîskar û siyasetmedar	Elmaniya
Arşev Oskan	Nivîskar	Elmaniya
Gulnar Elî	Helbestvan	USA
Derwêş Xalib	Nivîskar	Qamişlo
Konê Reş	Nivîskar	Qamişlo
Dr. Alî Kiliç	Nivîskar, dîrokzan	Parîs